Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :989 | 21-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Zarokan hînî Zonêma bikin

**Li bakurê Kurdistaê şanoya Kirmanckî**

Li Bakurê Kurdistanê komeke şanoyê heye ku ji bo Kirmanckî li ser dika şanoyê bûye zar û ziman.

Navê wê "Gimgim Tiyatro Zonêma" ye. Lîstikvanên komê ji bo ku Kirmanckî bimîne, hewl didin, lê dibêjin, dewleta Tirkan ya dagîrker gelek zehmetiyan ji wan re derdixe.

Kom sala 2016´an li Izmîrê



hatiye damezirandin û şano û skeçên xwe hemûyan bi Kirmanckî pêşkêş dike. Ji lîstikvanên koma 'Gimgim Tiyatro Zonêma' Dunya Şanikan ji ajansa nûçeyan PîrHayê re peyiviye û dibêje, "Ji bo ku Kirmanckî tine nebe, çi ji destê me tê em dikin. Zextên dewleta Tirk di tinebûna zimanê me de bi roleke mezin radibin. Lê kes nayê nava mala me, me yekser asteng nake, yanî em dikarin li malên xwe bi zarokên xwe re bi zimanê xwe bipeyivin. Em ji zarokên xwe re behsa Elewîtiyê bikin, bi zimanê xwe bi wan re bipeyivin û çanda xwe bi wan re parve bikin."

Lîstikvanekî din ê komê Mehmet Yoran jî dibêje, "Ji bo ku zimanê me tine nebe, lazim e

*Ozgûr Polîtîka*

# Zanyaran fêm kir ka pêşû çawa bêhna mirovan dikin

**Pêşûyên mê bê wergirên xwe yên bêhnê dikarin bêhna mirovan bikin. Ev jî nîşan dide ku kêzik xwediyên pergaleke din ya bêhnstendine ne.**



Pêşûyên mê, tevî ku wergirên wan ê bêhna mirovan ji antênên wan hatin derxistin jî karîbûn bêhna mirovan bigrin. Ev yek jî jî nîşan dide ku pergala wan a bêhn standinê zêde ye.

Pêşûyên mê ji bo ku hêkên xwe xweyî bike, xwîna pêwîst ji kokteyla bêhnê ya mirov û heywanan digre. Li gorî lêkolîna di kovara zanistî ya Cell de hate weşandin, kêzik bêhnê ji noronên ku agahiya bêhnê yên ku di antênên wan de heyî, digrin.

Alîkara doçenta biyolojiyê a Zanîngeha Boston û nivîskarên sereke yên lêkolînê Meg Younger û hevalên wê ji bo ku noronên bêhnê ya mirovan di antênên pêşûyên me de bêbandor bikin têknolojiya serastkirina genan CRISPR'yi bi kar anîn.

Lêkolîner hêvî dikir ku noronên bêhngirtinê bêbandor bikin, lê dîtin ku pêşû hîn jî dikare bêhna mirovan bigre.


Ev yek nîşan dide ku dema pêşû yek yan zêdetir wergirên behnê winda bike jî, dikare bêhna mirovan bigre. Lêkolîner diyar dikin ku ev pergala cihgirtinê wekî mekanîzmaya misogeriya jiyanê, ava bûye. Lêkolîner diyar dikin ku van ev lêkolîn ji bo bizanin bê ka pêşû çawan dikarin bêhna mirovan bigrin û ji bo pêşilêgirtina gezkirinê û her wiha ji bo pêşîgirtina li nexweşiyên ta û dang ên ji ber pêşûyan belav dibin, dikarin bikar bînin.

*ANF*

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | X | A | V | I | K | | B | Î | R |
| 2 | | W | | R | E | S | E | N | |
| 3 | L | A | M | | N | A | L | | Ş |
| 4 | I | | Î | D | | R | | L | A |
| 5 | C | A | | A | E | | N | | N |
| 6 | Ê | | A | X | | Z | A | X | O |
| 7 | | T | V | | T | O | | O | |
| 8 | J | Î | | K | A | | A | R | D |
| 9 | I | R | S | Î | | K | A | T | O |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Pirsek di rewşa ne tewandî de... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
2. Cureyekî berê ji bîstanan tê hilîn... Ji wî/ji wê
3. Ji bo kerr bimeşe tê gotin... Teref
4. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Bajarekî me
5. Di dîrokê de dewleteke kurdan... Notayek... Daçekek
6. Sala borî... Tûj
7. Kurtebêja Zîvê... Pirsek di rewşa tewandî de
8. Hezkiriya Derwêşê Evdî
9. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Bajarekî me

**JOR-JÊR**

1. Paytexta Sûriyeyê... Xwîşka bavê mirov
2. Îşaret, şop... Navçeyeke Elezîzê... Notayek
3. Di zimanê zarokan de lêxistin... Genimê kutayî û kelandî
4. Tiştê ku pê debar tê kirin... Sendîkaya Karkeran a Swêdê
5. Tîpên navîn ê "saet"ê... Plakaya navneteweyî ya Îranê... Dengdêrên "pêça"yê
6. Serok û mîrê komeke mêşên hingiv
7. Notayek... Pirç
8. Daçekek ku wateyê xurt dike
9. Hejmarek... Bi awayekî mecazî jina xweşik, spehî, nazenîn û cazîbedar

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bendav | Ji bo komkirina avê, avdan û kehrebeyê benda li ser çemê avê hatî çêkirin. Sed. |
| Dirav | Pere. |
| Girav | Erdê hawîrdorê wî bi avê hatî pêçan. Cezîre. |
| Eger | 1. Ku: Ku tu neyî ez jî naçim. 2. Sedem: Dewletê egera bihakirina benzînê diyar kir. Divê em şehîdan bikin egera xurtkirina têkoşînê. |
| Jineolojî (Fransî) | Zanista jinê. |
| Peyman | Lihevkirin. |
| Pênase | Danasîn, te´rîf. |
| Piyale | Qedeh, berdaq. |
| Sinc | Exlaq. |
| Xwerek | Tiştên hişk yên dibin xwarin: Birinc, nok, nîsk û hwd. |



# `Kilîta çareseriya krîza cîhanê azadiya Rêber Apo ye`

Têkildarî tecrîda giran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Rewda Hesen diyar kir ku, gotineke Rêber Ocalan tenê gelek pirsgirêkan çareser dike. Lewra her ku diçe dewleta tirkî ya dagîrker tecrîdê girantir dike. ***R-5***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 989 | 21-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# PARIZVANÊ ZAROKÊN CÎHANÊ(UN)!

## LI HEMBER KUŞTINA ZAROKÊN KURD BÊDENGE




### Rêveberiya Xweser: Emê hesabê kuştina zarokan ji dewleta tirkî bixwazin

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê êrişa dewleta tirkî ya li ser navenda Fêrkirinê ya zarokên şermezar kir û got, êrîşên dewleta tirkî yên li dijî herêmê tevayiya qanûnan binpê dikin û emê hesab bixwazin. ***R-3***

### 'Têkoşîna li hemberî êrişên Tirkan erkê exlaqî yê her mirovî ye'

Remzî Şêxmûs diyar kir ku armanca dagîrkeriya tirkî qirkirina gelên herêmê yên resen e û wiha got: "Parastina herêmê ne erkê QSD'ê tenê ye, erkê her mirovê xwdîşeref û xwedînamûs e." ***R-4***

### Nakokî li bersivên xwe digerin

Mehmet Serdar ***R-5***

### YPJ: Li dijî xeteriya DAIŞ û Tirkiyê xwedî helwest bin

**YPJ'ê di daxuyaniya xwe de banga hêzên navnetewî kir ku êdî çavê xwe li dijî sûcên dewleta tirkî ya dagirker negirin û got, dewleta tirk a faşîst bi hemû havîtiyên xwe hewl dide ku tola DAIŞ`ê ji hêzên YPJ'ê rake û DAIŞ'ê ji nû ve zindî bike. Li berçavên cîhanê sûcê mirovahiyê dike, lê cîhan bêdenge. R-3**

### Dayîkên şehîdan: Divê koalisyon qada hawayî li ber balafirên tirkî bigire

Dayîkên şehîdan dan zanîn ku heta balafir û êrişên dagîrkeriya tirkî neyên sekinandin, ew ranawestin û wê çalakiyên wan dewam bikin. Herwiha gotin, em nahêlin dagîrker projeya Neteweya Demokratîk ya biratiya gelan têk bibin û emê ji bo şervanên azadiyê bibin hêz. ***R-2***



### Amadekariya xwarina zivistanê




Welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê çanda kevin ya ji dapîrên xwe girtîn diparêzin û her sal demsala payîzê xwarina zivistanê hazir dikin. Lewra zivistanê her xwerek peyda nabe. Herwiha xwerekê bi destê jinan tê amadekirin ji yên hazir baştir û bitendûristtir e. ***R-6***

### Ozan Comerd: Hunermend ronakbîrên civakê ne



Hunermend Comerd bal kişand ser rol û misyona hunermandan ya di nava civaka Kurd û têkoşîna ku niha ji bo azadiya Kurdistanê tê meşandin de û got, "Keç û xortên me têkoşîna xwe gerdûnî kirine, lê wek hunermend me nikariye wê têkoşînê bi hunerê vebêjin." ***R-7***

**Erdogan li ber deriyê Esad çok daniye...**



**Faruk Sakik** ***R-4***

**Bêpîvanbûna îdeolojîk, ezbeniyeke bêhempa ji dijmin re ye**



**Idrîs Henan** ***R-5***

**Xwe li dîntiyê dayne heyra...**



**Dijwar Ehmed Axa** ***R-7***

### 'QSD wê bi gel re bi ser bikeve û herêmên dagîrkirî jî rizgar bikin'

***R-2***

# 'QSD wê bi gel re bi ser bikeve û herêmên dagîrkirî jî rizgar bikin'

Henan Osman diyar kir ku armanca êrişên ser herêmê têkbirina şoreşa jinê ye û got, şehîdxistina jinên pêşeng rakirina tola şkandina DAIŞ'ê ye. Lê eger gel bi hêza xwe bawer be wê herêmên dagîrkirî bên rizgarkirin û ev pêvajo bibe pêvajoya serkeftinê.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê piştî civîna Tehran û Soçî êrişên xwe yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirin. Her roj gelek deverên kantonên Hesekê, Qamişlo, Kobanê, Girê Spî, Minbicê û gundên navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê topbaran dike. Di encamê de gelek welatî şehîd û birîndar dibin. Herwiha zirarên madî digihîjin welatiyan. Li hemberî van êrişan amadekariyên mezin ji aliyê gelê herêmê, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û QSD'ê ve tên kirin.

Li ser mijarê Cîgira Kongreya Star şaxê li Lubnanê Henan Osman ji me re axivî.

Henan Osman diyar kir ku dewleta tirkî ya faşîst ya dagîrker bi armanca têkbirina aramiya herêmê êrîşên xwe yên ser gelên bakur û rojhilatê Sûriyê yên bi balafirên bêmirov zêde kirine û wiha got: "Armanca wê têkbirina aramiya herêmê, belavkirina aloziyê û dagîrkirina tevayiya bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Bi hinceta parastina ewleyiya xwe ya neteweyî, her roj êrîşên xwe yên hewayî û topan zêde dike û welatiyan dike amanc. Dewleta tirkî ya terorîst dixwaze tola şkandina çeteyên DAIŞ'ê rake, ji ber wê pêşengên çeteyên DAIŞ'ê têk birîn, dike amanc."

**'Dagîrkeriya tirkî jina azad dike amanc'**

Henan Osman da zanîn ku armanca zêdebûna êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê hemdemî salvegera şoreşa Rojava ya ku jinê pêşengiya wê kir, tê wateya şerê li dijî jina azad û wiha got: "Dagîrkeriya tirkî zêdetir jinên pêşengên şoreşa Rojava dike amanc. Ew dizane ku şoreşa azadiyê bi pêşengiya jinan bi rê ve diçe, lewma jinên pêşeng dike amanc. Herwiha çi kesê bawerî bi vê şoreşê anî û kevirê bingehî jê re danî, dike amanc. Herwiha dagîrkeriya tirkî bi komkujiyan li dijî welatiyan dixwaze tirsê di dilê gelên herêmê de çêke û tevayiya gelên herêmê koçber bike; dixwaze peyamekê bide gelên li Tirkiyê jî ku ti carî di xewna xwe de jî li ser



azadiyê nefikirin û di navxweyî de dîktatoriyekê mayşnde bide qebûlkirin."

**'Tirkiy amade ye ku çeteyên Sûrî bi erzanî bifiroşe'**

Henan da xuyakirin ku dibe di demên bê de Tirkiye çeteyên Sûrî yên ku alîkariya wî di şerê li dijî gelên Sûriyê de dikirin, radestî hikumeta Şamê bike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dagîrkeriya tirkî dibe ku di demekê nêz de çeteyên Sûriyê yên ku ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn, radestî rêjima Esed bike. Ji dema Osmaniyan ve heta niha, Tirkiye kesên ku xiyaneta xaka xwe dikin û dibin çeteyên wê, wan difiroşe. Niha eşkere dibêje bila rêjim û çeteyên wê lihevkirinekê çêkin. Tirkiye ji bo têkbirina Rêveberiya Xweser, tişta ku neke nîne."

**'Operasyona 'Sondê' gelek planên MÎT'ê bêbandor kirin'**

Henan bal kişand ser Operasyona Sondê ku QSD'ê li dijî sîxurên dewleta tirkî dabû destpêkirin û wiha got: "Bi Operesyona QSD'ê ya Sondê diyar bû ku xetera herî mezin ya li ser herêmê kiryarên ji aliyê sîxurên MÎT'a Tirkan ve tên kirin e. Ji ber ku kesî ku sîxurtiyê ji dijminê gelê xwe re dike, wekî bombeyekê di nava gel de ye, tişta ku dijmin nikaribe bike ew dike. Ji bo wê operasyona li dijî sîxuran di vê demê de pir girîng e û peyamekê dide dijmin ku wê planên wan yên qirêj tev têk biçin. Her kes dizane ku Tirkiye wê ji bo armancên xwe tevayiya rêbazan bi kar bîne û rêbaza wê ya ku herî zêde jê re dibe destek, bikaranîna kesên xayîn û xwefiroş in. JI ber wê bêbandorkirina sîxuran derbeeke mezin li planên Tirkan dixe."

**'Li hemberî şerê taybet yê dewleta tirkî xwebirêxistinkirin girîng e'**

Henan Osman diyar kir ku divê hêzên navnetewyî rê li pêşiya êrişên dagîrkeriya tirkî bigirin û wiha got: "Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê di ber tevayiya cîhanê de şerê çeteyên DAIŞ'ê kirin û bi hezaran şehîd dan. Divê civaka navneteweyî erkê xwe yê exlaqî pêk bîne û li dijî hovîtiya dewleta Tirkiyê helwesta xwe eşkere bike.
Cîgira Kongreya Star şaxê Lubnanê Henan Osman bang li gelên herêmê kir ku li hemberî êrişan rêxistibûna xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Divê gelên herêmê ji zarokan heta pîr û kalan li ser bingehê Şerê Gel yê Şoreşgerî xwe birêxistin bikin û xwe ji şerekî dijwar re amade bikin. Dagîrkerî bi Şerî Taybet dixwaze baweriya gel bişkîne. Li hemberî wî divê gel hişyar be. Eger gelên herêmê bi xwe bawer bin, wê QSD li hemberî dagîrkeriya tirkî bi ser bikeve û herêmên dagîrkirî jî rizgar bike."

# Dayîkên şehîdan: Divê koalisyon qada hawayî li ber balafirên tirkî bigire

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Dayîkên şehîdan dan zanîn ku heta balafir û êrişên dagîrkeriya tirkî neyên sekinandin, ew ranawestin û wê çalakiyên wan dewam bikin. Herwiha gotin, em nahêlin dagîrker projeya Neteweya Demokratîk ya biratiya gelan têk bibin û emê ji bo şervanên azadiyê bibin hêz.**

12`ê Tebaxê Hêzên Parastina Civakî yên jin, bi koordîneya Kongreya Star, bi armanca şermezarkirina bêdengiya li hemberî êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û banga girtina qada hewayî li ber balafirên Tirkan, konê çalakiyan li ber Navenda Neteweyên Yekbûyî ya bajarê Qamişlo vedan. Di çalakiyê de tevayiya jinên herêma Cizîrê dewr digirin û rojane banga girtina qada hewayî ya herêmê tê kirin.

Derbarê çalakiya konvedanê ya li Qamişlo û armanca wê de, dayîkên şehîdan yên ku beşdarî çalakiyê bûne, êrişên dagîrkeriya tirkî yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û gotin, em bêhelwestiya NY qebûl nakin, heta nefesa dawî emê li ber xwe bidin û têkoşînê bikin.

**`Wê çalakiyên me yên ji bo girtina qada hewayî dewam bikin'**

Dayîka şehîd Cemşîd Qamişlo, Delal Bedûr diyar kir ku armanca wan ji vê çalakiyê ew e ku qada hewayî ya bakur û rojhilatê Sûriyê li ber balafirên dewleta tirkî ya dagîrker bê girtin û axaftina xwe wiha dewam kir: "Wê çalakiyên me yên ji bo girtina qada hewayî dewam bikin, da ku dengê me bigihîje tevayiya cîhanê û armanca me pêk were. Tirkiye rojane êrişî me dike, zarok, ciwan, kesên bi temen û jinên me dike amanc. Ma zarokên me çi ji dewleta tirkî kirine. Ev zarok ji bo aramiya herêmê têdikoşin. Erkê me ye ku em beşdarî vê têkoşînê



bibin. Em ji bo bidestxistina azadiya xwe tev digerin, me êrişî kesekî nekiriye. Dagîrkeriya tirkî bi çi mafî êrişî herêmên me dike. Ji bo wê jî em bang li rêxistinên mafên mirovan dikin, ku çavên xwe ji van komkojiyê re negirin û zaxtê li Tirkiyê bikin, da balafirên xwe bide sekinandin. Ma heta kengî wê dilê dayîkên Rojava bişewitînin û zarokan bê dê û bav bihêlin."

**`Emê projeya Neteweya Demokratîk bi ser bixin`**

Delal diyar kir ku dagîrkeriya tirkî biratiya gelan û fikrê Neteweya Demokratîk ya li herêmê qebûl nake û wiha pê da çû: "Dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze destkeftiyên ku bi xwîna zarokên me hatine bidestxistin, têk bibe û projeya Neteweya Demokratîk bêbandor bike. Çimkî Neteweya Demokrarîk bandoreke mezin li sîstema dagîrker û qirker dike. Herwiha got, wê xetera li ser Tirkiyê mezintir bibe û hewldanên wê bi ser nekevin. Ji ber ku gelê herêmê bi hev re û bi ruhê biratya gelan li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî li ber xwe didin. Emê projeya Neteweya Demokratîk bi ser bixin û hêz bidin şervanên xwe yên azadiyê."





**`Em dev ji xaka xwe ya bi xwîna zarokên me hatî avdan bernadin`**

Dalal Bedûr di dawiya axaftina xwe de got, heta ku balafir û êrişên dagîrkeriya tirkî li dijî xaka me neyên sekinandin, em ranawestin û wê çalakiyên me jî bidomin. Em xwediyên vê xakê ne ku bi xwîna xort û keçên me yên berxwedêr hatiye avdan. Xaka ku bêhna azadiyê jê tê, em dev jê bernedin.

**`Emê dawî li dagîrkeriya tirkî bînin`**

Dayîka şehîd Sema, Salha Mustefa jî êrişên hewayî yên dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî gund û bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û got, ev êriş bûn sedema şehadeta gelek welatiyên herêmê bi taybetî zarokan. Dewleta Tirkan bi êrîşên xwe hewl dide ewleyî û aramiya li herêmê têk bibe û tirsê bixe nava gel. Lê gelê ku li beramberî çeteyên DAIŞ`ê û Çebhet El Nusra şer kiriye ti caran natirse û bin nakeve. Çawa ku me dawî li çeteyên DAIŞ`ê anî, emê dawî li dagîrkeriya tirkî jî bînin. Salha têkildarî helwesta civata navneteweyî ya derbarê êrişên li dijî herêmê wiha got: "Dagîrkeriya tirkî êrişên xwe li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne û civata navneteweyî jî li hemberî vê yekê bêdeng e. Ev bêdengiya wê nîşan dide, ku ew jî şirîka dagîrkeriya tirkî ye. Ji bo wê jî em dibêjin; çi dibe bila bibe, em dev ji bostek axa xwe bernadin û emê heta nefesa dawî li ber xwe bidin.

**`Emê li pişta şervanên xwe bin`**

Salha Mustefa di dawiyê de got, wek dayîkên şehîdan û jinên azadîxwaz, emê li ber xwe bidin û her kêliyê banga girtina qada hewayî bikin. Herwiha emê li pişta şervanên xwe bin û çi were ser milê me emê bikin.



# Ozan Comerd: Hunermend ronakbîrên civakê ne

Hunermend Comerd bal kişand ser rol û misyona hunermandan ya di nava civaka Kurd û têkoşîna ku niha ji bo azadiya Kurdistanê tê meşandin de û got, "Keç û xortên me têkoşîna xwe gerdûnî kirine, lê wek hunermend me nikariye wê têkoşînê bi hunerê vebêjin."

Têkildarî erk û berpirsyartiyên hunermendên Kurd a di vê povajoya têkoşînê de, Hunermandê Kurd Ozan Comert ji ajansa me re axivî û diyar kir ku wek gel pêwîste nirxê ku bi têkoşînê hatî bi destxistin were parastin û wiha got: "Nirxên ku keç û xortên me li serê çiya bi destxistîn, pêwîste wek hunermend em jî bi vekirina akademî û xwe pêşxistinê van nirxan biparêzin. Em li gorî nirxên ku hatîn bi destxistin gelek li paş mane. Gotinek heye ku dibêjin; 'Em evîndarê xwe ne, lê pêwîste em ne evîndarê xwe bin em bibin evîndarê gelê xwe.'

**'Bi hunerê pêşengtî ji civakê re dikin'**

Ozan Comert destnîşa kirin ku hunermend pêşengtî ji civakan re dikin û bi hunera xwe rê nîşanî civakê dike û wiha domand: "Li ser vê axa pîroz şaristaniya mirovahiyê hatiye avakirin. Bav, kal û rêberên me di çand û hunerê de kesayetên mîna Ehmedê Xanê, Melayê Cizirî, Melayê Batayê û bi sedan kesên din de pêşengî ji civak û derdora xwe re kirine. Di roja îro de jî hunermendên Kurd pêşengtiyê dikin. Ji roja destpêkê heta niha Kurdan bi hunera xwe xweda, xweza û mirovahî xemilandine. Bi hezaran kilam, çîrok û romanên me hene. Hunermend ji bo dîroka mirovahiyê û gel her tim bûne rêber. Bi navek din hunermend ronakbîrên civakên e. Ji ber ku dema mirovan şohrê xwe li hember desthildaran winda dikirin hunermendan bi helberst, çîrok û kilamên xwe gel ronî kirin."

**'Hunermend wijdana gelê xwe ye'**

Comert di berdewama axaftina xwe de qala têkoşîna tevgera azadiyê û bandoriya vê têkoşînê yên li ser rewşenbîrên cîhanê kir û wiha pêde çû: "Reweşebîrek yên cîhan dema qala berxwedana jinên Kurd dike, dibêje; 'Ew firişteyên demokrasiyê ne' nirxdayînek ewqas mezin heye. Ev demek dirêje li ser vê axê şer tê meşandin. Ev şer li ser ziman, çand, fikir û ramanê gelê Kurd tê meşandin. Divê hunermed pêşengtî û ronakbîriyê ji civakê re bikin. Hunermend wijdana gelê xwe ye. Ger hunermend rola xwe raste rast bileyîze, şer di pêngava duyem de tê destgirtin. Serokatî dibêje; 'Li cihê siyset û mantiq nemîne, şer destpê dike.' Ji bo ku rêya siyaset, Huner û çandê were vekirin pêwîste hunermend rolê sereke bileyîze. Hunermend gerdûniye, zarokên gelê Kurd jî têkoşîna xwe kirine malê gerdûnê, lê em ne li kêlek wan em gelek li pişt wan mane. Ew ronakbîriya ku ew didin, em nadin. Xebat tê kirin lê ne li gorî pêvajoyê ye. Zilma li Rojhilata Navîn bi destê NATO'yê bi taybet li ser Kurdan tê meşandin. Dewleta Tirk li Rojhilata Navîn ti nirxekî mirovatî, xwezayî û ne jî yê olî nehêlaye. Hêza xwe hemû ji bo tinekirin û bişaftina ziman û çanda me bi kar tîne."

**'Kar û xebatek tê kirin lê têrê nake'**

Ozan Comert di dirêjiya axaftina xwe de da zanîn xebata ku hunermendên Kurd di vê pêvajoyê de didin meşandin, gelek kême û wiha got: "Kar û xebatek tê kirin, lê têrê nake. Gelek rewşenbirên cîhanê fikrê Rêbertî ji xwe re wek çirayekê dibînin. Keç û xortên Kurdan destê xwe ji cîhanê vekişandin bê navber ji bo azadiya gelê Kurd û mirovahiyê têkoşînê dikin. Nirxê ku hatiye bi destxistin em nekarin bi kilemekî ji bo cîhanê vebêjin, ev ji bo me şermeke. Em dikarin bêjin heta niha ti hunermendekî Kurd li ser dika cîhanê bi nirxandin an ji kilamekê rewşa li Rojhilatan Navîn û şerê tinekirina Kurdan ne vegotiye. Ev nirxên pîroz yên hatîn bi destxistin nayên ser ziman. Ez nirx didim xebata heyî lê li gor nirxên ku hatiye avakirin gelek kêm dibînim. Nirxê hatî bidestxistin gerdûniye, lê wek hunermend em wî nirxî di hindir de dihêlin nakin bikin malê gerdûnê. Heta



niha di aliyê hunerî de gelek kêm berhemên me bûne malê gerdûnê. Hêviyên me nivşên nû û ciwanên me ne. Ew dikarin ji bo pêşeroja me guhertinên mezin bibin çêkirin."

Ozan Comert bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Nirxên ku keçê û xortên me li serê çiya bi destxistin pêwîste wek hunermend em jî bi vekirina akademî û xwe pêşxistinê van nirxan biparêzin. Em li gor nirxên hatî bi destxistin gelek li paş mane. Gotinek heye ku dibêjin; 'Em evîndarê xwe ne, lê pêwîste em ne evîndarê xwe bin em bibin evîndarê gelê xwe.'"
***RONNEWS***

# Pêlavên "Kilaş" û keda jinan

**Dîroka pêlavên "Kilaş" yên çanda taybet ya herêma Hewramanê ya Kurdistanê ya bi hezarê salan e. Pêlavên sivik, bi tendurist û xwezayî bi keda jinan çêdibin.**

Pêlavên bi navê "Kilaş" ku parçeyek ji çanda Hewraman e, bi dîroka xwe ya taybet û tevna xwe ya erdnîgarî mirovan li xwe diheyirîne. Pêlavên ku ji bilî sivik û bi tendurist in, di tevayiya pêvajoyê çêkirina xwe de bi keda dest tên çêkirin hîn jî pir tên bikaranîn. Pêlavên "Kilaş" ji du beşên cuda pêk tên. Binê pêlavê û beşa jor ya bi têlên pembû yên qalind tê honan. Binê wan jî ji çerm e.

**Di çêkirina wê de kedeke mezin heye**

Piraniya welatiyên li herêmê dijîn di çêkirina "Kilaş" de serdest in. Ev pêlav digel ku di jiyana rojane de tên bikaranîn herî zêde di rojên taybet de tên wergirtin. Pêlavên "Kilaş" yên hilberandina wê gelek zehmet e û tev bi nexşên destan û kedeke mezin ya destan tên çêkirin. Bi giranî xwediya vê kedê jin in.

**7 sal in "Kilaş"ê hildiberîne**

Somayeh Habîbî hilberînerek ku di çêkirina "Kilaş" de salên dirêj kedê dide, karsaz û jinên dixwazin weke wê bixebitin re jî derfetên kar diafirîne. Somayeh Habîbî (31) di warê zanistên perwerdeyê de lîsans kiriye û di salên dawî de jî debara xwe bi çêkirina wan de dibîne. Somayeh Habîbî diyar kir ku ji sala 2015'an û ve bi awayekî profesyonel dest bi vî karî kiriye û got, di vî karî de bi giranî mirovên ji herêma Hewramanê dixebitin, ji ber ku "Kilaşan" reseniya xwe ji vê digire.




**Zirarê nadin xwezayê**

Jina ciwan wiha dibêje: "Qet zirarê nadin jîngehê lewra ji berhemen xwezayî tê çêkirin. Ji ber ku ew bi lingên kesên ku li xwe dikin re aghengî çêdike, xwêdan jî nade û ji bo meşên dirêj jî qet nabe sedem ku di laş de êş çêbibe." Somayeh Habîbî diyar kir ku di mijara bidestxistina beramberê keda xwe de zehmetiyê dikişîne û got, em bi krediyan bi zehmetî li ser piyan dimînin û divê kredî werin dayîn.

**Dixwaze bi zêdetir jinan re bi hevparî hilberîne**

Somayeh Habîbî da zanîn ku bi taybetî beşa honanê ya pîşeyê bi giranî ji jinan pêk tê û wiha got: "Jinên dihonin bi awayekî serbixwe dixebitin û mixabin ne xwediyê ti mafî ne. Ez dixwazim di demên pêş de çalaktir bim, bi zêdetir jinan re bi hevparî bixebitim, piştgiriya hev bikin û parastina mafê hev bikin." Somayeh Habîbî da xuyakirin ku dixwaze bi jiyandina hunerên destan, debara xwe bike ku jin bibin xwedî debara aborî, di vê çarçoveyê de bang li hemû jinan dike.
***JINHA***

TÎR



## Xwe li dîntiyê dayne heyra...

Dijwar Ehmed Axa

Di dîroka gelan de, çîrok, serpêhatî û zargotin hene. Ew jî dibin çand kultûra gelan. Dibêjin, carekê zilamek pir deyndar dibe û rojane sê, çar kes li deryê wî dixin doza pareyên xwe di dikin. Êdî nazane bê çi bike. Pir aciz dibe û bêhna wî teng dibe. Hevalekî wî ku pir jê hes dike. Diçe cem da bizane ka di çi rewşê de ye. Piştî ku fêm dike, jê re dibêje, tu bi yan min bikî, xwe li dîntiyê dayne. Dibêje, çilo? Dibêje, zimanê xwe ji devê xwe derx xwe çewtomewto bike û devê xwe jî xwaromaro bik wê her kes bêje qey tu dîn bûyî.
Mêrik guhê xwe dide şîreta hevalê xwe. Rojek, dido, sisê xwediyên deynan tên doza pareyên xwe lê dikin. Dibînin mêrik wek dîna lê hatiye. Radibin ji hev re dibêjin ka em bêhna xwe çendrojekî din jî lê fireh bikin. Mêrik bêhna wî tê ber, rûyê wî geş dibe û xwîn têyiyê. Hevalê wî yê şîret lê kirî pareyên wî jî lê hene, jê re dibêje heyra va min belaya wan ji te vekir de ka pareyên min bide min. Mêrik zimanê xwe derdixe û jê re dibêje, lo lo lo lo tir tir tir ha ha ha ... hevalê wî jê re dibêje, kuro ev ji xelkê re ye ne ji min re.
Îcar ez nizanim bê kê şîret li Tirkan kirne, lewra dema em doza mafê xwe li wan dikin, dibêjin, yabo ma qey hûn tenê li Tirkiyê ne! Laz hene, Çerkes hene, Azerî hene, Angoş hene, Ermen hene, Ereb hene, Rûm hene, Gurcî hene, Turkmen hene, Kirgiz hene, Kazak hene, Turkistanî hene, Çeçan hene, Tirk hene, Kurd hene. Meqseda wan ku me jî weke xwe mihacir hesab bikin. Me digot lawo li ser vê xakê yên resen û esîl Kurd tenê ne. Em li welatê xwe rûniştî ne. Armanca wan ew bû ku me jî weke xwe hesab bikin, di nava xwe de bihelînin û winda bikin.
Kesê ku ti kes behsa wan nake, dixwazin xwe bi navûdeng bikin. Zilamek hebûye hayê ti kesî jê tinebûye. Ne ti kes guhê xwe didiyê û ne qala wî dikin. Ji ber wê carekê diçe di cirnê mala axê de dirî. Serê sibehê deng belav dibe; kê di cirnê mala axê de rîtiye, kê wilo kiriye? Ev zilam destê xwe li depê singa xwe dixe, dibêje, min wisa kiriye. Bi wî awayî binavûdeng dibe û li her derê navê wî belav dibe.
Ev jî Tirk in. Eger mirov ji wan pirs bike bêje, hûn ji kû ne wê bêjin, em ji Stenbolê, Izmîrê, Enqerê ne. Baş e hûn ji kû hatine van bajarên mezin? Dibêjin, em nizanin, kalik me hatine vir. Temam ka navê bapîrê xwe bêjin! Dibêjin, weleh em nizanin. Lê li me Kurdan binêrin, yê herî kêm dikare navê xwe heta bavê Heftan bêje.
Mînak; kurê min navê wî Hesen e, kurê Dijwar, kurê Ehmed, kurê Husên, kurê Esed, kurê Ehmed, kurê Miho. Ev bûn heft bav.
De ka hûn bi qedrê Xwedê kin, kî dîn e, em yan Tirk?
Weke kesê şîret li hevalê xwe kirî wilo li me hatiye. Me Tirk kirin xwedîdewlet lê niha dixwazin me tine bikin û dema em doza mafê xwe dikin xwe li dîntiyê datînin. Ma ne heqê me û hê musteheqê me jî maye…

# Amadekariya xwarina zivistanê

**Welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê çanda kevin ya ji dapîrên xwe girtîn diparêzin û her sal demsala payîzê xwarina zivistanê hazir dikin. Lewra zivistanê her xwerek peyda nabe. Herwiha xwerekê bi destê jinan tê amadekirin ji yên hazir baştir û bitendûristtir e.**

**Darîn Silê-Qamişlo**

Dema dibe Payîz walatî berê xwe didin bazarê da ku xwarina zivistanê hazir bikin. Çimkî demsala zivistanê xwarin kêm e û her tişt peyda nabe. Ji bo wê welatî berî hatina Payîzê xwarina zivistanê hazir dikin. Herwiha gelek cureyên pêxwarinên zivistanê weke penîr, îsotên sor, rêçala fêkiyan, zeytûn, bacanên hişkkirî, ava bacanan, mekdos û gelek pêxwarinên din. Lê li bakur û rojhilatê Sûriyê ya herî girîng ava bacanan e. Tevî ku çêkirina wê pir biha ye, lê hê jî gel haziriya wê dike. Lewra pir jê hes dikin û di gelek xwarinan de bi kar tînin.

Derbarê amadekariya xwarina zivistanê de bi taybetî amadekirina ava bacanan, jina bi navê Rojîn Îbrahîm ya ji bajarê Qamişlo ku çend roj in dest bi çêkirina ava bacanan kiriye, ji me re axivî û diyar kir ku ava bacanan ya ku li malê tê çêkirin ji ya bazarê xweştir û baştir e.

Rojîn Îbrahîm awayê çêkirina ava bacanan ya ku ji dapîrên xwe hîn bûye, ji me re parve kir û wiha got: "Ez bacanan bi avê baş dişûm û her bacanê dikim çar parçe. Pişt re xwê lê dikim û datînim ber tavê da ku hişk bibe. Piştî ku ava wan ziwa dibe ez dixim makîneyê û baş diguvêşim, heriwha bincikan jê dertînim û ava wan careke din datînim ber tavê da ku bibe ava bacanan. Nêzî çar yan pênc rojan li ber tavê dihêlim heta ku ziwa dibe."

**`Ez ava bacanan di gelek xwarinan de bi kar tînim`**



Rojîn got, dema ku ava bacanan li ber tavê datînim rojê sê caran lê meyze dikim û eger tiştek li ser rûyê wê hebe ez paqij dikim. Piştî ku ziwa dibe jî ez dixim deboyan û qumaşê pembû li rûyê wê dikim, da ku av bi ser nekeve û xirab nebe. Bi vî awayî ez ava bacanên xwe hazir dikim û zivistanê, di nava gelek xwarinan de bi kar tînim.

**`Tama wê ji ya hazir xweştir e`**

Rojîn da zanîn ku ew her sal nêzî 200 kîlo bacan çêdike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Her 10 kîlo bacan kîloyek ava bacanan jê derdikeve. Dema ku ez 200 kîloyî çêdikim 20 kîlo ava bacanan jê derdikeve. Herwiha got, her kevçikek ji ava bacanên malê bi qasî çar kevçikên hazir e û tama wê jî ji ya hazir xweştir e."

**`Tevî ku bacan biha ne min amade kir`**

Rojîn bal kişand ser bihayê bacanan û got, îsal bacan pir biha ne û her kes nikare wan çêke. Min kîloya bacanan bi hezar û 200 lîreyên Sûrî ji bazarê kirî. Her 200 kîlo bacan nêzî 300 hezar pere lê diçin. Ji ber wê gelek malbat êdî nikarin ava bacanan li malê amade bikin. Lê Tevî ku bacan biha ne jî min amade kir, çimkî ji ya hazir hes nakim û ya malê paqijtir e.

**`Amadekirina xwerekan pêwîstiya zivistanê pêk tîne`**

Rojîn diyar kir ku ji bilî ava bacanan wê gelek xwerekên din ji bo demsala zivistanê hazir bike û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Tevî bihabûnê, ez pêxwarinên zivistanê amade dikim û dev ji vê çandê bernadim. Ji bilî ava bacanan ez tirşiya xiyar, îsot, megdos, bancanên hişkkirî û ava îsotên tûj amade dikim. Ev pêxwarin di demsala zivistanê pêwîstiya me pêk tînin. Çimkî zivistanê xwerek pir biha dibin û hin jê peyda nabin. Ji bo wê dema ku mirov niha haziriyên zivistanê bike, wê demê neçarî xwerekên hazir nabe."



**'Xwerekên malê ji bo tenduristiya mirov baştir in'**

Rojîn behsa cudayiya navbera xwerekên malê û yên hazir kir û axaftina xwe wiha qedand: "Xwerekên ku li malê bi destê jinan tên çêkirin, ji yên hazir cudatir in. Çimkî yên malê baş tên şûştin û mirov dizane ka çawa hatiye çêkirin. Lê yên hazir piraniya wan baş nayên amadekirin û hin jê ne paqij in. Ji bo wê jî ya baş ew e ku, mirov her tiştî bi destê xwe amade bike." Herwiha got, xwerekên malê ji bo tenduristiya mirov jî baştir in. Bi taybetî di vê dema niha de gelek nexweşî derketine holê. Ji bo wê pêwîst e mirov derbarê xwerekên hazir de baldar be û giraniyê bide xwerekên malê.

# Enerjiya bêdawî ya li Herekolê

**Li çiyayê Herekolê, em li kampeke zivistanê ya gerîla ne. Gelek gerîlayên li kampê îsal hatine çiyayên Botanê.**

Li Herekolê em li kampeke zivistanê ne. Tiştên ku bîskeke din qalê bikim, nîşaneya wê yekê ye ku dewleta Tirk çi dike bila bike, wê ti carî nikaribe li pêşiya têkoşîna azadiyê ya gerîla bibe asteng.

Li çiyayê Herekolê, em li kampeke zivistanê ya gerîla ne. Gelek gerîlayên li kampê îsal hatine çiyayên Botanê.

Ji aliyekî ve coş, kêfxweşiya cihgirtina li şerê gerîla yê li eniya Bakur bi wan re heye, li aliyê din jî hewl didin li ser şert û mercên şerê li Bakur kûr bibin. Yên bi salan e li vir şer dikin jî bi berpirsyariya pêşengiyê dixebitin.

Mehên payîzê di êrişên dewleta Tirk a dagirker de yên li Herekolê de, jeneratorek kete dest, vê yekê gerîlayên li kampê xiste nava fikaran. Yên ku li van çiyayan dimînin, zanin ku ji bo jiyana li kampê, perwerdeyeke berhemdar, pêwîstî bi çavkaniyeke enerjiyê heye. Gerîla bi pêkankirina ya nepêkan tê naskirin.

Hêza kampê ya ku çû kampên zivistanê, kete nava lêgerîna li enerjiyê. Jeneratoreke gelekî kevn dîtin ku ji rêyeke dûr anîn. Kesî hêvî jê nedikir ku jenerator bixebite, lê belê piştî ku Zerdeşt ê ji aliyê teknîkê ve pispor e dest lê werda, jenerator xebitî. Ji ber ku tenê çend caran xebitî, hêviya bi enerjiyê ya li kampê careke din têk çû. Destpêkê bêdengiyeke kûr li kampê çêbû. Di nava vê bêdengiyê de fikrek derkete holê. Bi fikrê hevpar a Zerdeşt û Mîrza biryar hate dayin ku enerjiya alternatîf bê peydakirin.

**Êdî dînamoya me hebû**



Mîrza li pêşberî jeneratora xerabûyî heman pêşniyaz kir. Qet nebe, kampa lê bûn wê bihata ronîkirin. Gelo wê têrê bikira? Malzemeyên din ên teknîkê wê çi bibûya? Tablet, ya ku pirtûk li ser tê xwendin, kamera, kompûter, makîneya wêneyan û gelek malzemeyên din pêwîstiya xwe bi enerjiyê hebû. Ji ber ku li Botanê pêwîstî ye ku karên çapemenî û arşîvê bêne kirin. Zerdeşt û Mîrza yekser ketin nava liv û tevgerê. Min jî ew şopandin.

Di encama ceribandina bidestxistina enerjiyeke bilind de hin malzemeyên teknîkî yên biçûk îmha bûn, lê belê dînamoyek hate bidestxistin ku jeneratorê jî bêhtir enerjî jê peyda dibe.

Çavkaniya me ya enerjiyê, dînamo bi şev û roj ji aliyê me ve hate zîvirandin. Ji aliyê bidestxistina enerjiya herî bi lez de ti kes nedigihişt Rahîme, Rêdûr, Arîn û Nûman. Mîna ku di pêşbirkê de bûn. Enerjiya ku têra jiyana kampê bike, perwerdeyê temam bike, têra karên çapemeniyê bike bi vî rengî hate bidestxistin.

Li cihekî welê bifikirin; mehên zivistanê ji bilî gerîla ti zindî lê nîne. Zivistanê berf li ser berfê dibare, carna bi qasî 10 metreyan berf dibare. Li vê derê tenê berf dibare. Gerîla li kûrahiya vê qadê bi cih dibin û zivistanê hem ji ber ewlekariyê hem jî ji ber berfê pêwendiya xwe ya bi derve, bi ronahiya ji derve re qut dikin. Gerîla bi dil û mejiyê xwe kûrahiya erdê ronî û germ dikin. Çiya bi vê têkoşîna bi wate ya gerîla bûne qadên pîroz ên jiyanê. Di her fikrî de, di her çalakiyê de hêviyeke mezin, daxwaz û kedeke mezin heye.

* Jiyan Amargî gerîlayeke rojnamevan bû û di êrişa dewleta Tirk a li dijî Herekolê de di şer de 20´ê Hezîrana 2022´yan şehîd bû. Ev nivîsa wê di ANF´ê de hatiye weşandin.

***ANF***



# YPJ: Li dijî xeteriya DAIŞ û Tirkiyê xwedî helwestbin

**YPJ'ê di daxuyaniya xwe de banga hêzên navnetewî kir ku êdî çavê xwe li dijî sûcên dewleta tirkî ya dagirker negirin û got, dewleta tirk a faşîst bi hemû hovîtiyên xwe hewl dide ku tola DAIŞ`ê ji hêzên YPJ'ê rake û DAIŞ'ê ji nû ve zindî bike. Li berçavên cîhanê sûcê mirovayiyê dike, lê cîhan bêdenge.**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) têkildarî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên vê dawiyê ku tê de hejmareke fermandar, pêşengên şoreşa Rojava û welatî û zarok şehîd bûne, daxuyaniyekê nivîskî weşand. YPJ`ê bal kişand ser bêdengiya dewletên navnetewî ya li dijî sûcên dewleta tirkî û banga hemû gelan kir ku li dijî sucên dewleta tirkî xwedî helwest bin.

Di daxuyaniya YPJ`ê de ev hate gotin:

"Şoreşa Rojava ya ku bi pêşengtiya hêzên YPJ'ê, keda gelê herêmê û bi xwîna dehan şervanên enternasyonalîst ve pêk hat, her dem bûye hedefa êrişên dewleta Tirk a dagirker û ew feraseta faşist bi alîkarî û fînansekirina çeteyên DAIŞ'ê, bi êrişên dagirkeriyê heya hedefkirina pêşengên şoreşa Rojava, êrişkariya xwe bi awayekî şênber raxistiye ber çavan. Dewleta Tirk a faşist bi van êrişan hewl dide tola DAIŞ ji hêzên YPJ'ê bigire û DAIŞ ji nû ve zindî bike.



Hemû cîhan dizane ku di pêşengtiya hêzên YPJ'ê de çeteyên DAIŞ têk çûn û bi vê serkeftinê şoreşa Rojava mezin bû û destkeftiyên YPJ'ê wisa ava bûn. Lê dewleta Tirk a dagirker û çete di sala 2016'an û vir de li Rojava, Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dîsa li herêmên dagirkirî bi tacîz, tecawiz, revandina mirovan, ziyanên madî û manewî, guhertina demografî, kiryarên asîmîlasyonê, qaçaqî û talankirina cihên dîrokî, talankirina xwezayê heya êrişên tang, top û balafirên keşfê ve her cure êrişê pêk tîne û mafên mirovan bin pê dike. Ev êrişên dewleta Tirk a dagirker û çete li ber çavê hemû cîhanê pêk tên û heya roja îro li hember van êrişên hovane jî, ji aliyê tu sazî û dezgehan ve helwest nehatiye nîşandan.

Li ser vî esasî bangawaziya me ji gelê me, sazî û dezgehên demokrasîxwaz ew e ku her kes li hember van êrişan li hember dewleta Tirk a kujer û çete doz vekin. Di heman demê de em ji Konseya Ewrûpa û Netewên Yekbûyî re dibêjin van sûcên dewleta Tirk a dagirker û çete bixin rojevên xwe û li hember van sûcan helwestên şênber ku van êrişan bide sekinandin, raber bikin. Dîsa hemû kesên parêzkar, parêzerên dost re dibêjin ku ew jî xwedî li vê dozê derkevin û parêzeriya vê dozê bikin.

Di dema herî nêz de navên hin welatî, zarok û pêşengên şoreşa Rojava ên ku şehîd û birîndar bûne wiha ne:

Sosin Bîrhat 19.08.2021 Şehîd bû

Rênas Roj (Selahettin Şehabî) – 19.08.2021- Şehîd bû.

Egîd Girkê Legê (Bêvan Remedan) – 19.08.2021- Şehîd bû.

Rûbar Hesekê (Elî Elxirze) – 19.08.2021- Şehîd bû.

Seyfullah Ehmed (Seyfullah Newaf Ehmed) 19.08.2021- Şehîd bû.

Yûsif Gulo-85 salî - 09.11.2021 Şehîd bû.

Mazlûm Gulo – 09.11.2021 Şehîd bû.

Mihemed Gulo – 09.11.2021 Şehîd bû.

Dilar Heleb (Ranya Henan) di 20.04.2022 Şehîd bû.

Ronahî Kobanî (Rodîn Ebdulqadir Mihemed)-20.04.2022 Şehîd bû.

Kobanî (Cîhan Nidal Elî)-20.04.2022 Şehîd bû.

Mizgîn Botan (Rahîme Xezalî)-30.05.2022 Şehîd bû.

Mizgîn Kobanê (Sîham Mislim)-02.07.2022 Şehîd bû.

Jiyan Tolhildan (Selwa Yûsif)-22.07.2022 Şehîd bû.

Roj Xabûr (Ciwana Heso)-22.07.2022 Şehîd bû.

Barîn Botan (Ruha Beşar)-22.07.2022 Şehîd bû.

Dîna Osman 6 Salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Mehmûd Xerîb Mamo 6 salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Hisên Cemal Qasim 7 salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Avrîn Ebdurehman Heyder 13 salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Orîvan Mihemed Ebdo 15 salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Hisên Beyrem Elîko 43 Salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Sebah Henan Hemo 10 Salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Azriya Ehmed Reşo 23 Salî-04.08.2022 Birîndar bû.

Ronah Silo 27 Salî-04.08.2022 Birîndar bû."

# Rêveberiya Xweser: Emê hesabê kuştina zarokan ji dewleta tirkî bixwazin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê êrişa dewleta tirkî ya li ser navenda Fêrkirinê ya zarokên şermezar kir û got, êrîşên dewleta tirkî yên li dijî herêmê tevayiya qanûnan binpê dikin û emê hesab bixwazin.**

18'yê vê mehê, dewleta tirkî ya dagîrker bi balfireke bêmirov êrişî navenda fêrkirinê ya zarokan ya li gundê Şemokê yê Hesekê ku Neteweyên Yekbûyî sponsoriya wê dike kir û di encama wê de 4 zarok şehîd bûn.

Derbarê êrişa dweleta tirkî ya dagîrker ya li ser navenda zarokan ya li gondê Şemokê de, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek da.

**'Di êrişên dewleta tirkî ya dgîrker de zarok dibin amanc'**

Rêveberiya Xweser di daxuyaniyê de êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ya li ser navenda fêrkirinê ya zarokên ya li gundê Şemokê yê Hesekê ku Neteweyên Yekbûyî sponsoriya wê dike, şermezar kir û wiha got: "Piştî hevdîtina dawî ya Erdogan bi aliyên navneteweyî û herêmî re, êrişên dagîrkeriya tirkî yên li dijî herêmên me zêde bûn. Di encama van êrişan de gelek sivîl, zarok û fermandarên li kêleka Koalisyona Navneteweyî li dijî rêxistina DAIŞ şer kirin şehîd bûn."

**'Êrişên dagîrkeriya tirkî tevayiya qanûnan binpê dikin'**

Rêveberiya Xweser da zanîn ku êrişên dewleta tirkî ya dagîrker tevayiya pîvanan binpê dikin û wiha got: "Dewleta tirkî di çarçoveya şerê xwe yê qirkirinê de li dijî gel û herêmên me êrişên nû pêk tîne. Mînaka wê jî dewleta tirkî ya faşîst bi balafirên bêmirov navenda Fêrkirinê ya taybet bi jinan ya li gundê Şemokê ku tenê 2 km dûrî baregeha Koalisyona Navneteweyî ye ku Neteweyên Yekbûyî sponsoriya wê dike, kir amanc. Di encamê de 4 zarok şehîd bûn û 11 zarokên keçîn birîndar bûn. Ev êrişa hovane hemû pîvan û qanûnan binpê dikin û sûcên şer in. D i heman demê de şerê qirkirinê yê li dijî gelê me pêk tê ye û rûyê din yê DAIŞ`ê ye."

Rêveberiya Xweser da zanîn ku ev êriş xeterê li ser zarokan, navendên fêrkirinê û sivîlan çêdike û wiha got: "Hincetên dewleta tirkî yên derew ji bo rewakirina êriş û dagîrkirina herêmên me ye. Xetera van êrişan rojane zêde dibe. Ev jî teqez dike ku Sûriye di binê xeter û gefa dewleta tirkî de ye û divê hemû sûrî vê yekê bizanin û dersan ji siyasetên dewleta tirkî derxin."

Rêveberiya Xweser navên şehîdên zarok ku di êrişa balafira dagirkeriya tirkî de ya li ser navenda perwerdeyê ya zarokan ya li gundê Şemokê ya Hesekê eşkere kirin.

Li gorî daxyuaniya Rêveberiya Xweser navên şehîdan wiha ne: Ranya Eta, Zozan Zêdan, Dîlan Izedîn, Diyane Elo.

# 'Têkoşîna li hemberî êrişên Tirkan erkê exlaqî yê her mirovî ye'

Remzî Şêxmûs diyar kir ku armanca dagîrkeriya tirkî qirkirina gelên herêmê yên resen e û wiha got: "Parastina herêmê ne erkê QSD'ê tenê ye, erkê her mirovê xwdîşeref û xwedînamûs e."

**Mihemed Xanim / Heleb**

Dewleta tirkî ya dagîrker rojbiroj êrîşên bi balafirên bêmirov yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pirtir dike. Di van êrîşan de gelek kesên hêja şehîd dibin. Ji destpêka meha Tebaxê ve êrişên dagîrkeriyê zêde bûne. Bi taybetî di van demên dawî de zarokan dike amanc û herî dawî jî navendeke zarokan ya di navbera hesekê û Til Temir de kir amanca êrişên xwe û di encamê de 4 zarok şehîd bûn. Li hemberî van êrişên dagîrkeriyê, QSD bêdeng namîne û li dijî artêşa tirkî çalakiyên bibandor dike. Li gorî ragihandina QSD'ê li dijî van êrişên hovane 4 çalekî kirine û nêzîkî 30 leşkerên Tirkan hatine hatine kuştin.

Derbarê zêdebûna êrişan de, bersiva QSD'ê û amadekariya gel ya li dijî êrişan, Endamê Navenda Partiya Dîmokratîk ya Kurdên Sûrî şaxê Helebê Remzî Şêxmûs, ji me re axivî.

Remzî Şêxmûs diyar kir ku armanca dagîrkeriya tirkî qirkirina gelên resen e û wiha got: " Erdogan hewl dide tevayiya herêmên bakur û rojhialtê Sûriyê dagîr bike û gelên herêmê yên resen qir bike. Xetera êrişên bi balafarên bêmirov, ji xetera êrişên bejayî ne kêmtir e. Lewra dagîrkerî bi van êrişan dixwaze baweriya gel bişkîne û herêmê vala bike."



## 'Bersiva QSD'ê baweriya gel xurt kir'

Remzî Şêxmûs bîr xist ku li hemberî êrişên dagîrkeriy atirkî hêzên QSD'ê stratejiya xwe eşkere ragehandiye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Stratejiya QSD'ê li hemberî êrişên Tirkan, bersiva her êrişê ye. Bi bersivaa QSD'ê peyam gihîşt tevayiya hêzan ku xwediyê vê xakê hene û dikarin bersiva her êrişê bidin. Em gelên bakur û rojhilatê Sûriyê û partiyên siyasî, piştgiriya QSD' ê dikin. QSD hêza gel ya rewa ye û rûmeta tevayiya gelên herêmê parast. Bersiva wê ya êrişên dagîrkeriyê baweriya gel xurttir kir. Ji ber wê, her kesê ku li ser xaka bakur û rojhilatê Sûriyê dijî, dive piştgiriya wê bike. Em deyndarên şehîdên canê xwe ji bo parstina me feda kirîn in. Herwiha divê Tirkiyêeû hevkarên wê bizanin ku li ser erdê Kurdistanê hêzek heye û wê bersiva êrişên wan bidin.

## 'Koalisyona Navnetweyî û Rûsya hevkarên rijandina xwîna gelên herêmê ne'

Remzî Şêxmûs bal kişand ser hevkariya hêzên navnetewyî ya bi dagîrkeriya Tirkiyê re û wiha got: "Gelek hêzên navnetewyî yên li ser xaka Sûriyê xwe bi cih kirine, di êrişan de alîkariya Tirkan dikin û hin hêz jî çavên xwe ji êrişên wê re digirin. Qada hewayî ya Sûriyê di binê kontrola Koalisyona Navnetewyî û Rûsya de ye. Rûs bi awayekî eşkere qada ezmanî ji Tirkan re vedikin û êrişên wê erê dikin. Koalisyona navnetewyî jî çavê xwe ji Tirkan re digire û dibêje, 'êriş bike'. Tevî ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo parastina cîhanê ji çeteyên DAIŞ'ê, bi hezaran şehîd dan, disa jî cîhan çavê xwe ji komkujiyên dagîrkeriya tirkî re digire û xiyanetê bi gelên herêmê re dike."

## 'Divê em ji hêzên xwe yên leşkerî re guh û çav bin'

Remzî Şêxmûs diyar kir ku bêbandorkirina sîxurên dewleta tirkî, di vê pêvajoyê de pir girîng e û wiha domand: "Her şoreşên di cîhanê de çêbûyî, deshilatdaran ji bo têkçûna wan şoreşan sîxur bi kar anîne. Di cîhanê de xiyanet û sîxurî bûne sedema binketina gelek şoreşan. Ji ber wê Operasyona Sondê operasyoneke pir girîng e û divê dewam bike. Dema sîxur tên girtin tevayiya kart û planên dijmin eşkere dibin. Sîxur ji dijmin re çav û guh in. Sîxurên roleke mezin di êrişên dagîrkeriyê de dilîzin. Divê gelên herêmê, ji zarokan heta pîr û kalan alîkariya QSD'ê bikin da tevayiya sîxur û xayîn bên cezakirin. Divê em ji hêzên xwe yên leşkerî re bibin guh û çav."

## 'Têkoşîna li hemberî êrişên dagîrkeriya tirkî erkê her mirovî ye'


Endamê Navenda Partiya Demokrat ya Kurdên Sûrî şaxê Helebê Remzî Şêxmûs, bang li gelên herêmê kir ku li gorî rewşa awarte xwe amade bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji destpêka şoreşa Rojava ve em di rewşa awarte de ne. Lewra her roj êriş li ser herêmên me hebûn û hê jî dewam dikin. Divê em xwe li gorî rewşa awarte amade bikin. Erkekî mezin dikeve ser milê me. Ji her kesî tê xwestin ku li gorî derfeta xwe têkoşînê bike. Lewra parastina herêmê, ne erkê QSD'ê tenê ye, erkê her mirovê li ser xaka bakur û rojhilatê Sûriyê dijî ye. Banga me ji bo gelên herêmê, partî, rêxistnên siyasî û civakî ew e ku xwe berpirs bibînin û li hemberî êrişan têkoşînê bikin."

# Belgeyek nû ya sûcên şer yên dewleta tirkî ya dagîrker diyar dike, derket holê

**Bi kamerayê dîmenên leşkerên Tirk yên dagîrker yên li dijî tûnelên şer yên Şehîd Hêjar yên li Qada Berxwedanê ya Girê Hekarî amadekarî dikin ku bi bombeyên taktîknûkleer û çekên kîmyayî êrîş bikin, hatin girtin.**

Êrîşên dagîrkeriyê yên ku artêşa Tirkan ya dagîrker di 14'ê Nîsana 2022'an de li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dayîn destpêkirin, dikeve meha 5an. Artêşa Tirkan ya dagîrker ku li hemberî Gerîlayên Azadiya Kurdistanê nikarin pêş ve biçin û di demeke kurt de ketin tengayiyê, di vê pêvajoyê de dîsa rêbazên xwe yên şerê qirêj xistin dewrê. Tûnel û çeperên li Qada Berxwedanê ya ku ji aliyê gerîla ve tê parastin, ji roja destpêkê ve bi awayekî dijwar balafirên şer û helîkopterên êrişê bi obûs û hawanan tên bombekirin.
Dewleta Tirkan ku bi piştgiriya bêsînor ya NATO'yê ji hemû derfetên teknolojiyê sûdê digire û erdnîgariya Kurdistanê her roj bi dehan caran bombebaran dike, gelek caran li hemberî gerîla bi bikaranîna bombeyên taktîknûkleer û çekên kîmyewî sûcên şer kir.
Gelek caran bi dîmenan sûcên şer yên dewleta Tirkan hatin ispatkirin û dîmeneke din jî li ser zêde bû. Bi kamerayê dîmenên leşkerên Tirk yên dagirker ên ku li dijî tunelên şer ên Şehîd Hêjar ên li





Qada Berxwedanê ya Girê Hekarî amadekarî dikin ku bi bombeyên taktîknûkleer û çekên kîmyewî êrîş bikin, hatin girtin. Dîmenan careke din şerê qirêj ku dagirker bi rê ve dibin, derxist holê.
Di dîmenan de diyar dibe ku leşkerên Tirk yên dagirker bi bandan, derdora teqemeniyan monte dikin û bombeyên taybet ên ku bandora bombeya taktîknûkleer çêdikin jî diyar dibe. Bombeyên taktîknûkleer ên ku 5 leşker bi hesasiyetek mezin hewl didin bi cih bikin û hemû jî bi qabloyan bi hev ve girêdayî ne, dibin li ber cihê ketin hundirê tûnelan. Dagîrkerên ku girîngiyeke mezin didin bombeyên taktîknûkleer û hêviya xwe pê girê dane, bombeyan di hembêza xwe de digirin û wêneyan digirin. Ev yek jî ispata agahiyên hatîn diyarkirin, nîşa dide. Dagîrkerên ku hewl didin bi teqînên mezin berxwedana gerîla bişkînin, bi qasî ku derfetê dibînin hewl didin bê navber tûnelên şer bombe bikin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê di daxuyaniya 17'ê Tebaxê dayî de diyar kiribû ku artêşa Tirkan di 4 mehên dawî de li dijî tûnel û çeperên şer yên li Qada Berxwedanê hezar û 532 caran bi bikaranîna bombeyên taktîknûkleer ên qedexekirî û çekên kîmyewî sûcê şer û mirovî kiribû.
***ANF***



## Erdogan li ber deriyê Esad çok daniye…

**Farûk SAKIK**

Belê, kodên hevdîtina Erdogan û Pûtîn ya li Soçî hêdî hêdî zelal dibin. Li ser tinekirina têkoşîna azadiya gelê Kurd, li Rojava şkandina îradeya Kurdan û bêîradehiştinê wan li hev kirine. Di vê hevdîtinê de mijareke esasî jî, bi rejima Sûrî re ji nû ve destpêkirina danûsandinan bû. Dixwest di êrişkirina Kurdistanê de destûra Sûrî jî bistîne.
Erdogan, berî ku here hilbijartinan wê êrişên ser herêma rojavayê Kurdistan parçeyekî kampanyaya hilbijartina xwe bi kar bîne. Erdogan îdia dike ku Pergala Rojavayê Kurdistanê ji bo ewleyiya wî gef û tehdîd e. Dibêje axa min, sînorên min di binê talûkeyê de ne. Ji herêma Kurdistanê ber bi aliyê min ve êriş hene. Lêbelê dewleta ku zimanê kurdî qedexe kiriye, dewleta ku Kurdan tine dihesibîne ango dewleta Tirkan, li cîhanê weke welatekî meşrû û rewa xuya dike. Ev dewletên cîhanê dizanin ev ne rast e lê ji bo berjewendiyên xwe dibêjin em hesasiyetên Tirkiyê mafdar dibînin.
Ya duduyan Erdogan bi dû diravan ketiye. Aboriya Tirkiyê dîroka komarê de, di rewşa herî xeter de ye. Ji bo wê li dijî Erdogan nerazîbûneke mezin heye. Gelek kes poşman in ku di hilbijartinên berê de deng dane AKP'ê. Ha hûnê bêjin li Sûrî diravên ku bîne Tirkiyê nînin. Lê li ser Rûsya re bi bazara, çeteyên di binê kontrola xwe de dikare van diravan bi dest bixe.
Sedema sisiyan ya êrişan; mijara koçberên Sûrîyê ye. Erdogan dît ku li Tirkiyê li hemberî van koçberan nerazîbûn heye. Jimara van kesên dijminatiya koçberan dikin jî roj bi roj zêde dibe. Dixwaze bi êrişa herêma rojavayê Kurdistanê re wan koçberan bîne li ser tixûb bi cih bike. Bi vê biryara xwe wê bersivekê bide nijadperestên Tirkiyê.
Dîsa wê bi çêkirina avayiyan ango ji sektora inşaatê pereyan bi dest bixe. Ji bo ku tehdîda koçberan ya çûna Ewropa dayî seknandin jî wê ji dewetên Ewropa pereyan bigire. Piştî bi van dît ku di aboriya Tirkiyê de guhertinên erînê çêbûn wê here hilbijartinan. Berpirsê çapemeniya QSD'ê Ferhad Şamî jî di daxuyaniyek xwe de bal kişandibû ser heman tiştî. Digot wê di demeke nêz de hin koçberan bînin Sûrî.
Ji bo ku bi van sedeman êrişan bide destpêkirin, divê di destpêkê de bi rejima Şamê re li hev bike. Ji bo wê demek dirêj e, veşartî yan jî eşkere hevdîtinan dest pê kirkiye.
Îtirafa yekê ji Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê Mevlut Çavuşoglu hat. Hevdîtina xwe ya bi Wezîrê Karê Derve yê Sûrî re îtiraf kir. Her çiqas pişt re got dive pirsgirêka Sûrî bi metodên siyasî werin çareserkirin jî êdî her kesî bawerî anî bû ku hevdîtin pêk hatiye.
Berî vê hevdîtinê 15 rojan Erdogan û Pûtîn, heyetek ji partiya Dogu Perînçek ku ji Ethem Sancak, Şûle Perînçek û hin kesên din pêk dihat çûbûn Rûsya. Li wir bi rayedarên dewletê re hevdîtin kiribûn. Her çiqas Perînçek digot, me ji bo hevkariya aborî ya Rûsya, Tirkiye û Îranê hevdîtin kiriye jî, esas armanc peyama Erdogan li ser Rûsyayê re bigîhînin Beşar Esad bû. Ango ev heyeta Perînçek, wek bûldozerekê pêşî li Erdogan vedike. A ha.. di dema ku min ev nivîs dinivîsî de, heman heyetê amadekarî dikir ku here Sûrî. Berî ku herin medya Erdogan ket dewrê û pesnê Sûrî dide. Ji bîr kirin ku Esad bi terorîstî bi nav dikirin.
Dewleta Tirkan ya dagîrker ji bo tinekirina Kurdan, li ber deriyê dijminê xwe çok daniye. Ji bo girtina vê destûra êrişê nirx û rûmeta xwe yên neteweyî tevan binpê dike.



# `Kilîta çareseriya krîza cîhanê azadiya Rêber Apo ye`

Têkildarî tecrîda giran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Rewda Hesen diyar kir ku, gotineke Rêber Ocalan tenê gelek pirsgirêkan çareser dike. Lewra her ku diçe dewleta tirkî ya dagîrker tecrîdê girantir dike.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Ji bo tinekirina fikir û felsefeyeke demokratîk, ji bo jiholerakirina jiyaneke birûmet, ji bo şkandina vîna gel, sala 1999`an li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, komploeyeke navneteweyî hat kirin. Ji wê demê heta roja îro, di şexsê Rêberê Kurdan Abdullah Ocalan de gelê Kurd li her çar parçeyên kurdistanê, di binê tecrîdeke giran de ne. Bi taybetî di vê dema dawî de, di binê navê cezayê disîplînê û hêcetên bêserûber de, dewleta tirkî ya faşist Rêber Apo xistiye binê tecrideke pir giran ku kesek nikare ti agahiyan derheqê wî de bigire. Çawa ku ev tecrîd li dijî qanûn û hiqûqa cîhanê tê tê kirin, herwiha li dijî gelê Kurd jî, şerê qirkirinê dest pê kiriye û di vî şerî de hemû qanûnên nav neteweyî û yên mirovî tê binpêkirin.

Têkildarê mijarê Hevseroka Desteya Çandê ya Herêmê Cizîrê Rewda Hesen ji rojnameye me re axivî û got, êdî her kes dizane ku ji ber fikir û ramanên Rêber Apo çareseriya pirsgirêk û krîzan e, ji ber wê her ku diçe dewleta faşîst tecrîdê girantir dike.

## 'Divê hevdîtin bi Rêber Apo re were kirin`

Rewda Hesen axaftina xwe wiha domand: "Êdî her kes vê yekê baş dizane ku armanc ji tecrîdê, qutkirina gel ji fikir û felsefeya Rêbertiyê ye. Ev yek bi rewşa dawî ya Rojava ve tê girêdan. Ji bo ku pesrpektîfên Rêbertiyê negihin destê me, dewleta tirkî ya dagîrker tecrîdê giran dike. Lewra nirxandin û pespektîfên Rêbertiyê di vê pêvajoya tevlihev û xeter de ku gelên cîhanê giş tê de ne, pir girîng û pêwîst e. Bi taybetî, li dijî polîtikayên dewletên dagîrker û qirker nêrînên Rêber Apo ji bo gelên azadixwaz pir girîng in."
Li ser bêdengiya saziyên navdewletî Reda got, divê dadgehên navdewletî û rêxistinên mafê mirovan, erkê xwe yê mirovî pêk bînin.

## `Bêdengî hevkarî ye`

Herwiha li ser bêdengiya hêzên navdewletî ya li hemberî tecrîdê, Rewda diyar kir ku bêdengî hevkarî ye û wiha domant: "Li dijî tecrîda li ser Rêbertiyê cîhan bêdeng e, ev bê dengî jî tê wateya ku ew jî bi biryara dîlgirtin û girankirina tecrîdê



re ne. Hêzên serdest sîstema sermayedar ji bo berjewendiyên xwe li ser gel bi kar tînin, rêber Apo dijî vê sîstêmê ku civakê dirizîne, têkoşîneke bêhempa kir û heta niha wê tûkoşînê didomîne. Herwiha Sîstema Neteweya Demokratîk ya li dijî sîstema desthilat ya sermayedar ji gelan re ava kir ku gel bikarin li dijî desthilatê mafê xwe bi dest bixin û biparêzin. Lewra ev jiyana azad û wekhev ya ku Rêbertiya me hilbijartî, li ser berjewendiyên hêzên serdest, metirsiyeke mezin çêdike. Lewra wê gel li dijî zilim û mafxwarinê serê hilde."

## `Bi saya Rêbertiyê em azad dijîn`

Rewda Hesen axaftina xwe wiha domand: "Ji bo parastina mafê jinan, Rêber Apo pir ked daye. Ne tenê ji bo jinên Kurd yan jinên bakur û rojhilatê Sûriyê. Rêbertiyê ji bo parastina jinên cîhanê tevan xebitiye. Niha encama vê xebatê derdikeve hole. Mînaka wê niha gelek jinan li cîhanê bi riya pirtûkên rêber Apo xwe nas kir û dîroka jinê nas kirin. Ji ber wê divê jinên me ji bo azadiya Rêber Apo di hemû qadên civakî, siyasî, diplomasî, hiquqî, hunerî û hwd. de cihê xwe bigirin û herî zêde divê em li dijî vê tecrîdê têbikoşin."

Hevseroka Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Rewda Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Pêwîst e her kes û bi taybetî jin li rêber Apo xwedî derkevin û asta têkoşîna xwe xwirttir bikin. Divê em bi berxwedana xwe, Rêberê xwe azad bikin. Divê dengê me li cîhanê tevê belav bibe û em bibin wesîleya belavkirina fikir û felsefeya Rêber Apo. Bi balavkirina fikrê rêber Apo û avakirina jiyanê bi projeyên wî, em dikarin li şoreşa xwe ya bi xwîna şehîdan hatiye avdan, xwedî derkevin. Lewra di vê projeya Neteweya Demokratîk tenê de jiyana azad û birûmet heye."

## Nakokî li bersivên xwe digerin



**Mehmet Serdar**

Dewleta tirkî ya dagîrker piştî dagîrkirina Girê Spî û Serê Kaniyê mafê xwe yê rewa ragihandiye ku ji sînorê welatê xwe heta 30 km. bi kûrayî dagîr bike û li wir herêmeke qaşo ewle ava bike. Herêmên ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve hatîn dagîrkirin heta niha li ber çavê cîhanê tevê, tevayiya mafê mirovayiyê tê binpêkirin û sûcên dijmirovî rojbiroj pirtir dibin.
Herwiha ne ewlekarî ne jî aramî û aboriyeke ji bo civak jiyana xwe bidomîne ti kes nikare jê behs bike. Tenê ji bo malbatên weke çeteyên kirêkirî li ser hesabê Tirkan di her eniyê de şer dikin, hatine bicîhkirin. Aramiyeke demî ji bo malbatê çeteyan hatiye avakirin.
Ji ber şart û mercên ne guncaw, herêmên plansaziya dagîrkirinê li ser heyî nayên dagîrkirin, li benda dema herî gûncaw in. Ev herêm li gorî axaftina şefê faşîst Erdogan, seranserê sînor 30 km. bi kûrayî. Çawa ku ev herêm di civîneke fermî de pêşkêşî dewleta Tirkiyê ya dagirker hatine kirin û ew jî wan herêman weke tapuya li ser navê xwe dibîne. Herwiha pir bi hesanî mafê xwe dibîne ku bi keyfa xwe li ser biryarê bide.
Hemû civînên navdewletî û civînên taybet li ser paşroja Sûrî dewleta dagîrker ya Tirkiyê, bernameya dagirkirinên cihê mayî ji bo bê domandin zextê li hemû dewletan dike. Ji bo demeke zûtir bernameya xwe ya dagîrkeriyê bi ser bixe. Ev helwest û siyaseta dijminayiya dewleta dagîrker ya tirkî, hêzên navnewletî ku xwe garantor bi nav dikin, ji ber hinceta tirsa ewlekariyê Tirkiyê ji sînorên xwe, rewa dibînin.
Dewleta dagîrker ya tirkî jî her çiqas di niqaşên fermî û torên ragihandinan de wek hinceta dagîrkeriyê fikarên ewlehiyê diyar bike jî, di nava xwe de ev herêmên mijara nîqaşê weke beşeke ya Tirkiyê dibîne û li her derê behsa ``Mîsaq-î mîllî`` dike. Ev nakokî ji aliyê hêzên navdewletî û hêzên qaşo garantor ve heta niha nayên dîtin, yan jî li ser tê girtin.
Mijareke din jî ya li ser tê girtin û heta niha helwestek nehatiye diyarkirin, mijara erîşên balafirên keşfê ne. Piştî dagîrkirina Grê Spî û Serê Kaniyê weke me li jor gotî, ji ber domandina dagîrkerî guncaw nehat dîtin, heta rewş ji bo dagîrkerî guncaw be, îcaze hatiye dayîn ku dewleta dagirker ya tirkî êrîşên xwe li ser hedefên ji bo ewlekariya tirkî xeter bê dîtin bi balafirên keşfê ji holê rake.
Dewleta dagîrker ya tirkî ji bo êrîşên xwe yê bi balafirên keşfê pêk bîne, li gorî qanûnên hevpeymaniya li dijî DAIŞ`ê divê plansaziya çalakiyên xwe ragihîne navenda hevpeymaniyê û biryargeha hevbeş ya hevpeymaniyê, eger îcaze dan dikare bi balafirê keşfê çalakiyekê bike. Lê yên vê hevpeymaniyê dizanin, baş dizanin ku ji her êrîşeke balafirên keşfê ya dewleta tirkiyê ya dagirker, biryargeha hevpeymaniya giştî agahdare.
Di vê mijarê de du nakokiyên mezin hene ku di raya gîştî de tên nîqaşkirin. Ya yekê eger êrişên balafirên keşfê yên dewleta dagirker yên Tirkiyê, biryargeha hevpeymanî agahdar e çima heta niha ji êrîşan re çavê xwe digire. Ewê ku êrîş li ser çêdibin, fermandariya hêzên hevpeyman û herwiha serokê DYA fermî şirîkê xwe îlan kiribû, û civînên fermî de spas jê re kirin. Eger QSD şirîka wan e çima hember êrîşên dijî QSD bêdeng dimînin, ev çawa şirîkatî ye.
Nakokiya duduyan jî ji aliyê gelek çavdêran ve hatiye şopandin û sedemê wê tê pirskirin ew e ku, kengê ji aliyê hêzên hevpeymanî ve di nava herêmên dagîrkirî yên di binê kontrola Tirka de, kengê operasyonek li hember rêveberên DAIŞ`ê çêbe, wek bersivdana vê operasyona hevpeymanî, dewleta dagîrker ya tirkî çend seetan nakeve navberê êrîşeke bi balafirên keşfê li dijî QSD pêk tîne. Ruxmî ku hemû cîhan alîkarî û desteka dewleta dagirker ya tirkî ji bo rêxistina terorist ya DAIŞ`ê dizanin jî çima hevpeymaniya navdewletî li hemberî her êrîşeke çeteyan, êrîşên dewleta dagirker ya tirkî li hember fermandarên QSD çavên xwe digire.
Ev rewş ji aliyê hemû çavdêrên siyasî ve wek ``navbera hevpeymaniya navdewletî û dewleta dagîrker ya tirkî ve peymanek veşartî heye û li gorî wê peymanê tev digerin`` tê şîrovekirin. Li hemberî hemû êrîş û sûcên şer yên dewleta dagirker ya tirkî, hêzên hevpeymaniya navdewletî çavên xwe girtine û erênî yan jî neyînî heta niha helwestek nîşan nedane. Ev sekin û bêhelwestî, gotin û çavdêriyên aliyên îddîa dikin ku peymaneke veşartî di navbera wan de heye, piştrast dike. Li vir pirsa girîng ew e ku divê bê pirsîn, li hemberî şirîkên xwe, tevlîbûna peymanên veşartî di çanda we de navê wê çi ye?

FENER

## Bêpîvanbûna îdeolojîk, ezbeniyeke bêhempa ji dijmin re ye



**Idrîs HENAN**

Gelek xalên girîng ên ku pêwîst e werin nîqaşkirin û yên ku lazim e careke din di ber çavan re werin derbaskirin hene mirov qalê bike. Gelek ji wan serpêhatiyan bûne sedema lawaziya sekin û berxwedana ku pêwîst e were raberkirin. Ango; weke aktorekî sereke bi rola valakirina herêmê û têkbirina enerjiya ciwanan, rabûye. Vê yekê bi xwe re kansera gendelî û xwefirotinê normalîze kiriye û weke tişteke ji rêzê kiriye. Lewre, em dibînin ku rojane neyarên Kurdan, pêşeng û lîderên wan ên qehreman armanc digire û kêlî bi kêlî zarokên me qetil dike. Bêperwa û bêar in, her nirxê gelan rûbirûyî karanîn û çewsandinê dihêlin û li gorî berjewendiya çawîşan bi awayekî xirab tev digerin.
Ewqas rûyê azadiya civakê berovajî kirine û destwerdana heysiyat û wijdanê mirovan kirine û bes hiştine, ji xwezêdekirin û xwetêrkirina ajoyan wêdetir tiştek pêşkêş nekirine. Nexwaşiyên xwe kirine malê civakê û pê mijûl kirine û ji bona fesadî û kurtêlxwariya xwe zemînek xort a hizirî û her cure ziyanê ava kirine.
Hewl didin bi zêdekirina pirsgirêkên exlaqî, êrişên hişberiyê û destwerdanên derûnî, tesîrek giran û bi bandor li sekna civakê bikin û îradeya wê parçe bikin. Navenda azadî û demokrasiyê ku bi xwîna zarokên herêmê hatiye destnîşankirin, dixwazin vala derxînin û ji nav bibin. Ancax ew yek bi avakirina hişmendiyek qurnaz a feodal ku her tiştî dixe mijara bazarê, pêkan be. Lewre; heman alav û elementên sazîbûna demokratîk bi kar tînin û weke pireke desthilatdariyê, ji bo mayîndekirin û domdariya hebûneke îlegal dixebitînin.
Yekemîn deriyê fireh ku ev xisûs û xisletên han tê re bi aramî derbas dibin, deriyên perwerdê ne. Dema ku perwerdekarên civakê û rêveberên civakê bi xwe, xwe têr û bes bibînin, di cewherê nêzîkatiya rasteqîn de, redkirina perwerdê û agahiyên tê de ye. Ango; vê lawaziyê astengiyên zinhî bi xwe re tekûztir kirine û mûfirkek li ser zêde kirine. Bi van rêbazên nenaskirina girîngiya perwerdê û nêzîkatiyên feodal ên perjewendîparêz û qurnaz, artêşek ji mûçegiran dane avakirin ku amade ye di her kêlî û cihî de, ji bo manfeeta xwe, her tiştî bixe mijara kirîn û firotinê. Ev yek rê li ber texrîbatên mezin vedike û di serî de ewlehî û aramiya civakê têk dibe. Ji xwe armanca sereke ya van êrişên şerê taybet ew e ku bi amûrên êrişan ên derûnî, civakê bê perwerde bihêlin û amûra sereke ya parastinê ji dest bibin. Li cihê ku xwe hewceyî perwerdê neyê dîtin, zanibe ku şerê taybet hakim bûye û êdî ev cih di bin bandora wê hizrê de xetimiye. Elimandin bi pêş ketiye û pêşdaraziya mirovan tûşî çala neyar û dagirkeran dike, belav bûye. Di heyameke wisa de, ku yek ji armancên sereke ya êrişên li ser civakek şoreşger e, artêşek ji leşkerên belaş ava dike. Kîjan dem û mekanî be, dikare ji bona neyar û celadên xwe, ezbeniyeke bêhempa bike. Mînaka wê jî di encama hemleya "Sond" a vê dawiyê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk derket holê ka çiqas kirêt û xirab e.
Nêzîkatî û têgihaştinên li gorî elimandinên dewletdar neyên mehkûmkirin, li gorî pîvanên ideolojîk kesayet neyên hilbijartin û hesabên guncaw di wextê de neyên pirsîn, wê her tim qada têkoşînê nava şoreşê de ji destwerdana odeyên şerê taybet re vekirî bimîne û dê bi dehan ajanên bê rûmet û bê wijdan, karibin di her dem û kêliyê de, kesayetên fena Rêzan Cawîd û hevrêyên wî bikin qurbana berjewendiyên xwe, derkevin. Ji bona wê jî, pêwîst e civak ji van êrişan were parastin û li gorî erkên demê yên şerê gel ê şoreşgerî were biçekkirin.